# Bultena heftane

# 28/10/2023

Email: **starmalper13@gmail.com**

Facebook:kongra star-مؤتمر ستار

Youtube: kongra.star22@gmail.com

Nûçeyên ji cîhanê

## Li Spanyayê 39 milyon kesan ji bo mirovên oldar ên mêr heman îfadeyê dan

Li Îspanyayê ji sedî 0.6'ê mirovên mezin, ango nêzî 39 milyon kesan gotin ku zarok ji aliyê mêrên oldar ve rastî tacîza zayendî yan jî tecawizê hatine.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-spanyaye-39-milyon-kesan-ji-bo-miroven-oldar-en-mer-heman-ifadeye-dan-41707

Çavkanî:JINHA



## Serokomarê Fransayê xwest mafê kurtajê bikeve bin ewlehiyê

NAVENDA NÛÇEYAN - Serokomarê Fransayê Emmanuel Marcon li ser çapemeniya civakî daxuyakirin ku dixwaze mafê kurtajê bikeve bin ewlehiya destura bingehîn.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/220448

Çavkanî:JINNEWS




## Futboler Aitana Bonmatí xelata Topa Zêrîn a 2023'an wergirt

Futbolera spanî Aitana Bonmati di merasîma xelatkirina Topên Zêrîn de ku li Parîsê hat lidarxistin, Topa Zêrîn wek baştirîn futbolera cîhanê girt.

https://jinhaagency.com/ku/werzis/futboler-aitana-bonmati-xelata-topa-zerin-a-2023-an-wergirt-41763

Çavkanî:JINHA



## Xelata Lale ya Mafên Mirovan ji Hulya Gulbahar re hat dayîn

Xelata Lale ya Mafên Mirovan a ji aliyê Hikûmeta Hollandayê ve tê dayîn, îsal hêjayî dilxwaza EŞÎK'ê Hulya Gulbahar hat dîtin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/xelata-lale-ya-mafen-mirovan-ji-hulya-gulbahar-re-hat-dayin-41812

Çavkanî:JINHA



## [Jinên Sudanî hewl didin di nava pevçûnan de jiyanê ji nû ve ava bikin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-sudani-hewl-didin-di-nava-pevcunan-de-jiyane-ji-nu-ve-ava-bikin-41702)

Jinên ku ji ber pevçûnên çekdarî yên li Sudanê koçber bûne, bi firotina berhemên curbecur li herêmên ku dimînin hewl didin bijîn.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-sudani-hewl-didin-di-nava-pevcunan-de-jiyane-ji-nu-ve-ava-bikin-41702

Çavkanî:JINHA



## [Jinên ku ji Başûrê Lubnanê koçkirin behsa êrîşên Îsrailê kirin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-ku-ji-basure-lubnane-kockirin-behsa-erisen-Israile-kirin-41706)

**Ji ber êrîşên Îsrailê li sînorê Bakûrê Lubnanê gel ji malên xwe derdikevin û berê xwe didin qadên ku ji bo xwe ewle dibînin.**

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-ku-ji-basure-lubnane-kockirin-behsa-erisen-Israile-kirin-41706

Çavkanî:JINHA



## Li Sûdanê rewşa mirovahiyê ber bi xerabiyê ve diçe

Şert û mercên jiyanê û rewşa aborî ya welatiyan li Sûdanê her diçe xirabtir dibe. Bi taybetî kesên ku ji ber pevçûnên Sûdanê reviyane di nava zehmetiyan de dijîn.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-sudane-rewsa-mirovahiye-ber-bi-xerabiye-ve-dice-41709

Çavkanî:JINHA



## 'Zext wê bi berxwedana jinan bên şikandin'

Komeleya Hunermendên Sînema û Şanoya Îranê yên li Derveyî Welat, bal kişand ser zextên li ser hunermendên jin ên ku li Îranê li dijî ferzkirina sergêjiyê bertek nîşan didin, da zanîn ku wê zext bi berxwedanê werin şikandin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/zext-we-bi-berxwedana-jinan-ben-sikandin-41710

Çavkanî:JINHA



## Armîta Girawend piştî 28 rojan jiyana xwe ji dest da

Armîta Girawend  ya ku hinceta serê xwe negirtiye îşkence lê hatibû kirin û 28 rojan di komayê de ma, jiyana xwe ji dest da.

https://hawarnews.com/kr/armita-girawend-pisti-28-rojan-jiyana-xwe-ji-dest-da

Çavkanî:ANHA




## Li Antalyayê mirina bi guman a jinekê

ANTALYA - Li navçeya Kemer a Antalyayê jina bi navê Eslem Zehra Kiziltuna, li mala hevala xwe ku wek mîvan diman bi guman jiyana xwe ji dest da.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/220385

Çavkanî:JINNEWS



## Li gelek navendan mamosta daketin qadan

Xwepêşandana seranserî ya mamostayan a li dijî nedana muçe û tayîn nekirinê, li Silêmanî, Helebce, Germiyan, Ranya, Qeladizê, Koye, Şarezur, Seyîdsadiq, Çemçemal, Kifrî, Pêncwên, Dukan û Derbendîxan destpêkir.

https://rojnews.news/ku/?p=285379

Çavkanî:ROJNEWS




## Xwendekarên jin ên Zanîngeha Dîcleyê bi tacîz û gefan re rûbirû ne!

Xwendekarên jin ên Zanîngeha Dîcleyê ku li yurda Îyaz Bin Ganem a di nava kampusê de dimînin, ji ber pirsgirêka rê her êvar bi tirsa tacîzê nîvsaet di riya tenha de dimeşin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/xwendekaren-jin-en-zaningeha-dicleye-bi-taciz-u-gefan-re-rubiru-ne-41718

Çavkanî:JINHA



## ‘Qumar polîtîkayek taybet a li dijî jinan e’

Endama Tevgera Azadiya Komeleya Kurdistanê Sara Reza diyar kir ku her cihê lê qûmar bê lîstin yan jî bazirganî li ser jinan were kirin, tiliya desthilatdariyê tê de heye û piştgiriyê dide.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/qumar-politikayek-taybet-a-li-diji-jinan-e-41722

Çavkanî:JINHA





## ‘Namzediya Cemîle Îsmail cesaretê da jinan’

Cemile Îsmail ku di hilbijartinên serokkomariya Misirê de bû namzed, li ser biryara partiya xwe ji namzediyê vekişiya. Jinên Misrê gotin: “Em bûn şahidê namzetbûnê. Vê rewşê cesaretê da gelek jinan.”

https://jinhaagency.com/ku/siyaset/namzediya-cemile-Ismail-cesarete-da-jinan-41726

Çavkanî:JINHA



## Piştî emeliyata dil Fatemeh Sepehrî cardin birin girtîgehê

Li Îranê girtiya siyasî Fatemeh Sepehrî, piştî emelyeta dil hê tedawiya wê temamnebûyî cardin birin girtîgehê.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/pisti-emeliyata-dil-fatemeh-sepehri-cardin-bir-girtigehe-41728

Çavkanî:JINHA



## ‘Divê li Lubnanê mafê kurtajê bidin jinan’

Jinên Lubnanê diyar kirin ku li Lubnanê zagon di şertên diyar de destûr didin pêkanîna kurtajê, dan zanîn ku divê çarçoveya zagonê were berfirehkirin û bê îstîsna mafê kurtajê bê dayîn.

https://jinhaagency.com/ku/tenduristi/dive-li-lubnane-mafe-kurtaje-bidin-jinan-41730

Çavkanî:JINHA



## [Parêzer Cennet Zugurli: Îşkence êdî bi awayekî vekirî tê kirin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/parezer-cennet-zugurli-Iskence-edi-bi-awayeki-vekiri-te-kirin-41737)

Parêzera OHD’ê Cennet Zugurli, diyar kir ji ber polîtîkaya bêcezatiyê êdî îşkence bi awayekî vekirî tê kirin û destnîşan kir di dosyayan de ne kiryaran der barê mexdûran de, bi sûcdariya “Ji polîs re mukavemet” lêpirsîn tên vekirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/parezer-cennet-zugurli-Iskence-edi-bi-awayeki-vekiri-te-kirin-41737

Çavkanî:JINHA



## [Ji piştevanî û hilberînê re dibin mînak](https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/220396)

HATAY - Piştî erdhejê di encama hewldana Piştevaniya Jinan a Kirkyama bi dirûşma ‘em ê bi hilberînê hebin’ atolye hat avakirin û jinên li wir nexweş û fêrî dirûnê bûn, dest bi hilberînê û girtina sîparîşan kir. Jin li vir bi piştevanî, bi kewandina birînên xwe û hilberînê dibin mînak.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/220396

Çavkanî:JINNEWS



## Tulay Hatîmogullari: Me peyama gelê xwe girt!

ENQERE - Hevseroka giştî ya HEDEP'ê Tulay Hatîmogullari da zanîn ku gel ew hişyarkirine ku şaşiyên taktîkê nekin û van hişyariyan pêvajoya pêş de wê li ber çavan bigirin û got: “Me peyama gelê xwe girt. Peywira me ya esas ev e ku damarên xitimandî yên riya sêyemîn bên vekirinê.”

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/220400

Çavkanî:JINNEWS



## Narges Mohammadî: Armîtaya me ji ber nexwest porê xwe veşêre hat qetilkirin

Berdevka Navenda Parêzvanên Mafê Mirovan Narges Mohammadî ku li girtîgeha Evînê girtî ye diyar kir ku Armita Ground ji ber nexwest porê xwe veşêre hat qetilkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/narges-mohammadi-armitaya-me-ji-ber-nexwest-pore-xwe-vesere-hate-kustin-41738

Çavkanî:JINHA



## Mehtab Nasirpur piştgiri da lîstikvanên jin ên qedexeya kar girtine

Lîstikvana şano û sînemayê ya Îranê Mehtab Nasirpur ragihand ku ji bo piştgirîkirina şanogerên jin ên ku ji kar hatine qedexekirin êdî di tu sînema û şanoyê de rol nagrim.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/mehtab-nasirpur-pistgiri-da-listikvanen-jin-en-qedexeya-kar-girtine-41740

Çavkanî:JINHA



## Jinên Lîbyayê êrîşên Îsraîlê yên li dijî jin û zarokan şermezar kirin

Hejmarek zedê aktîvîstên jin ên Lîbyayî, diyar kirin ku êrîşên Îsraîl ên li ser Xezayê û di encama vê yekê de zirardayîn, qetilkirin û tirsandina zarok û jinan, di qada navneteweyî de sûcekî şer e.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-libyaye-erisen-Israile-yen-li-diji-jin-u-zarokan-sermezar-kirin-41742

Çavkanî:JINHA



## Li dijî civakê polîtîkayên şerê taybet tê meşandin

Rêvebera projeyan a Rêxistina Geşepêdana Medenî Kûjîn Osman bal kişand li ser zêdebûna bikar anîna madeyê hişbir ku weke polîtîkayek taybet ya li dijî civakê tê meşandin e û li dijî van polîtîkayan banga hişyariyê kir.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-diji-civake-politikayen-sere-taybet-te-mesandin-41744

Çavkanî:JINHA





## Festîvala Şano ya Jiwar: Divê ji hunermendên jin re bêtir derfet bê dayîn

Di 4. Festîvala Şano ya Monodrama ya Jiwar ku li Mehabadê hat lidarxistin de, peyam hat dayîn ku divê zêdetir derfet ji hunermendên jin re bên dayîn. Sara Kerîmî diyar kir ku hebûna nivîskar û derhênerên jin di guhertina civakê de gaveke girîng e.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/festivala-Sanoya-jiwar-dive-ji-hunermenden-jin-re-betir-derfet-be-dayin-41745

Çavkanî:JINHA



## Parêzer Nesrîn Sotudeh bi îşkenceyê hat binçavkirin

Parêzer Nesrîn Sotudeh a beşdarî merasîma cenazeyê Armîta Ground a li Îranê di encama îşkenceya polîsan de jiyana xwe ji dest da, bi îşkenceyê hat binçavkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/parezer-nesrin-sotudeh-bi-iskenceye-hat-bincavkirin-41758

Çavkanî:JINHA




## Li Misrê cihêkarî û tundî jinan ji jiyana kar dûr dixe

Li Misirê jinan di jiyana kar de bi gelek astengiyan re rû bi rû dimînin. Pispora Zayenda Civakî Aya Mahmud Omer diyar kir ji bo têkoşîna li dijî cihêkarî, tundî û tacîza li cihê kar divê tedbîrên xurt bên girtin.

https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/li-misre-cihekari-u-tundi-jinan-ji-jiyana-kar-dur-dixe-41759

Çavkanî:JINHA



## [‘Bê bernameyî bandorê li xwendina zarokan dike’](https://jinhaagency.com/ku/rojane/be-bernameyi-bandore-li-xwendina-zarokan-dike-41760)

Mamoste Pirsîn Hawjîn diyar kir ku di werza havînê de bernameyeke malbatan ji bo zarokên wan tune ye ev yek jî dibe sedem ku dema dibistan vedibin û xwendekar dest bi xwendinê dikin coş bi wan re tune ye û baş dest pê nakin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/be-bernameyi-bandore-li-xwendina-zarokan-dike-41760

Çavkanî:JINHA



## [‘Li Suweydayê rûyê rast ê hikumeta Şamê derket holê’](https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-suweydaye-ruye-rast-e-hikumeta-Same-derket-hole-41762)

Aktivîsta mafên mirovan Îman Abu Assaf diyar kir ku li Sûriyeyê tevgera gel bi xwe derketiye holê û destnîşan kir ku li Suweydayê tevgera ku dest pê kiriye rûyê rast ê hikumeta Şamê derxistiye holê.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-suweydaye-ruye-rast-e-hikumeta-Same-derket-hole-41762

Çavkanî:JINHA



## Jinên ji gundan berhemên xwe yên destan li Bojnurdê pêşan dan

Meryem Saedî diyar kir ku pêşangeha hunerên destan a li Bocnurdê hat vekirin, ji aliyê piştgiriya jinên herêmên gundewar ve gelekî xweş e û wiha got: "Ji ber ku li gundan binesaziyê û şert û mercên pêwîst nîne, em nikarin huner û zanaatê xwe bi pêş bixin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-ji-gundan-berhemen-xwe-yen-destan-li-bojnurde-pesan-dan-41764

Çavkanî:JINHA



## Derbarê Leyla Guven de biryara beraetê

Hevseroka KCD'ê Leyla Guven ji doza ku ji ber axaftina di bîranîna Taybet Înan de kiribû û dihat darizandin, beraet bû

https://jinhaagency.com/ku/hiq%C3%BBq/leyla-guven-ji-dozeke-li-silopyaye-beraet-bu-41767

Çavkanî:JINHA




## Li Mersînê tûndiya mêr

MERSÎN - Li navçeya Anamur a Mersînê mêrê bi navê M.T, xwişka xwe Serap Akdag, kur û hevjînê Serapê qetil kir.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/220565

Çavkanî:JINNEWS




## ‘Pêwîste demildest Werîşe Mûradî were azadkirin’

Mamostaya dibistana navîn ya Wargeha Penaberan a Mexmûrê Evîn Taybogan diyar kir ku welatên di bin navê îslamiyetê de xwe didin jiyankirin, welatên ku sîstema radîkal lê bicih bûye, li wan welatan jin tên qurbanî kirin.

https://rojnews.news/ku/?p=285674

Çavkanî:ROJNEWS



## Li Herêma Kurdistanê bûyerên tundûtijiya li dijî jinan zêde bûne

Bûyerên gefxwarin û destdirêjiya li dijî jinan bi rêya torên medyaya civakî û amûrên ragihandinê her ku diçe zêde dibin. Li gorî agahiyên ku ajansa me bidest xistiye, piraniya van dozan bi armanca wergirtina hinek pereyan tên kirin.

https://rojnews.news/ku/?p=285671

Çavkanî:ROJNEWS



## Li Misirê di dozên tundiya li ser jinan de daraz bêmafiyê dike

Parêzer Shaim Hassan diyar kir ku yek ji sedemên zêdebûna şîdeta li dijî jinan li Misirê biryarên darazê ne û got:"Tundî bi tedbîrên qanûnî nayê astengkirin. Dirêjkirina dozên tundiya li ser jinan bandoreke neyînî li edaletê dike."

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-misire-di-dozen-tundiya-li-ser-jinan-de-daraz-bemafiye-dike-41774

Çavkanî:JINHA




## Jinên Kirmaşanê ji bo Armîta bang kirin: Têbikoşin

Jinên Kirmaşanê bertek nîşanî qetilkirina Armîta Ground dan û gotin, "Heta ku Komara Îslamî li ser desthilatdariyê be, li ser van axan çewisandin û hicab a darê zorê dê ji bo jinan bibe xencereya mirinê."

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-kirmasane-ji-bo-armita-bang-kirin-tebikosin-41778

Çavkanî:JINHA




## Ji bo lîstikvanên Îranî piştgirî

Komeleya Derhênerên Sînemaya Îranê û Lijneya Bilind a Hilberînerên Sînemayê, di daxuyaniya xwe ya hevpar de piştgirî dan lîstikvanên jin ên ku ji kar hatine qedexekirin, hunermendan jî bertek nîşan dan.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/ji-bo-listikvanen-Irani-pistgiri-41779

Çavkanî:JINHA



## [‘Kontrolkirin ji bo tesbîtkirina penceşêra pêsîrê girîng e’](https://jinhaagency.com/ku/tenduristi/kontrolkirin-ji-bo-tesbitkirina-pencesera-pesire-giring-e-41780)

Bijîjk Ala Şalî diyar kir her diçe bûyerên penceşêra pêsîrê zêde dibin loma jî divê her kes ji bo agahdarbûna li tendirustiya xwe, kontrol bibin da ku bikaribin di demek kin de çareseriyê bibînin.

https://jinhaagency.com/ku/tenduristi/kontrolkirin-ji-bo-tesbitkirina-pencesera-pesire-giring-e-41780

Çavkanî:JINHA



## ['Divê ji bo anîmatoran cih werin avakirin'](https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/dive-ji-bo-animatoran-cih-werin-avakirin-41783)

Li Sineyê di çalakiya ku ji bo Roja Anîmasyonê ya Navneteweyî ya Cîhanî hat lidarxistin de bal hat kişandin ku ne tenê aliyê anîmasyonan ê şahiyê heye û hat diyarkirin di gelek waran de peyamên civakî jî tên dayîn.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/dive-ji-bo-animatoran-cih-werin-avakirin-41783

Çavkanî:JINHA



## [‘Divê em ji teşeyên fikrên mêr derkevin’](https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/220580)

ÎZMÎR - Li Îzmîrê di çarçoveya kampanyaya TJA’yê de atolyeyên xweser, tevlihev pêk tên û bi vê tê hedefkirin îradeya jinê ya rêxistinkirî derxin holê. Endama Endezyarên Azadîxwaz Utku Tutar a tevli li atolyeyê bû got: “Divê em wek zîhniyeta mêr nefikirin û ji teşeyê fikrên mêr derkevin. Divê em tevli xebatan û atolyeyên jineolojiyê bibin.”

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/220580

Çavkanî:JINNEWS




## Li Antalyayê mirina bi guman a zarokekê

ANTALYA - Li navçeya Muratpaşa a Antalyayê zaroka bi navê Aylîn Kaya bi awayekî guman mirî hat dîtin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/220628

Çavkanî:JINNEWS



## [‘Çareseriya krîzan Netewa Demokratîk e’](https://jinhaagency.com/ku/siyaset/Careseriya-krizan-netewa-demokratik-e-41799)

Hevseroka Meclisa Gel a Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî Filîz Budak diyar kir ku li dijî saziyên netew-dewletê divê yên modernîteya demokratîk werin avakirin û got ku bi modernîteya demokratîk azadiya zayendan pêkan e.

https://jinhaagency.com/ku/siyaset/Careseriya-krizan-netewa-demokratik-e-41799

Çavkanî:JINHA



## Parêzer Dîlan Koç: Li Mêrdînê tundiya bi unîforma zêde bû

Parêzer Dîlan Koç diyar kir ku li Mêrdînê tundiya bi unîforma zêde bûye û wiha got: “Dema em li nasnameya kiryaran dinêrin cerdevan in, bi taybetî jî bi çek in û dewletê jî digrin pişta xwe, helbet ev pêkanîna van kiryaran hêsantir dike.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/parezer-dilan-koc-li-merdine-tundiya-bi-uniforma-zede-bu-41800

Çavkanî:JINHA




## ‘Peymana pevguhertinê ji bo girtiyên jin ên Filistînî girîng e’

Siyasetmedar Hazal El-Natur bal kişand ser îşkenceya li ser jinên Filistînî yên ku ji aliyê Îsraîlê ve hatin binçavkirin û got ku di berdêla berdana girtiyên Filistînî de divê destekê bidin peymana pevguhertinê ya Hamasê ya berdana girtiyan.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/peymana-pevguhertine-ji-bo-girtiyen-jin-en-filistini-giring-e-41802

Çavkanî:JINHA



## Zêdebûna penceşêra pêsîrê gef li jiyana jinan dixwe

Penceşêra pêsîrê ya zêde dibe gef li jiyana jinan dixwe. Bijîjkên Tûnisî yên bal kişandin li ser metirsiya zêdebûna pênceşêra pêsîrê û bang li jinan kirin ku li hemberî wê hişyar tevbigerin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/zedebuna-pencesera-pesire-gef-li-jiyana-jinan-dixwe-41804

Çavkanî:JINHA



## ‘Çapemeniya Başûr berpirsyariya xwe ya li hemberî gel pêk nayne’

Rojnameger Niyan Mehmûd diyar kir ku divê karê sereke yê çapemeniya Başûrê Kurdistanê pirsgirêk û çareseriyên civaka Kurd be.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/Capemeniya-basur-berpirsyariya-xwe-ya-li-hemberi-gel-pek-nayne-41810

Çavkanî:JINHA



## Di 9 mehan de 21 jin hatin qetilkirin

EDENE - Platforma Jinan a Edeneyê, aşkere kir ku li bajêr 5 jê biguman 21 jin di encama tundiya mêr de hatin qetilkirin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/220673

Çavkanî:JINNEWS



Nûçeyên herêmî

## Ziheya ya ji gundê Bab El-Xêr: Em ê vegerin warên xwe

Ziheya Casim a ku ji ber dagirkeriya dewleta Tirk li gundê Bab El-Xêr a girêdayi Til Termirê dijî wiha dibêje: "Rûniştina li ser xetên agir ne tiştekî wiha hêsan e. Bila dagirker ji axa me derxînin û em vegerin warên xwe."

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/ziheya-ya-ji-gunde-bab-el-xer-em-e-vegerin-waren-xwe-41698

Çavkanî:JINHA



## Ji ber êrişên dewleta Tirk çandinî bi xeteriyê re rû bi rû ye

Hevseroka Desteya Çandiniyê ya herêma Firatê Sewsen Daban derbarê bandora êrişên dewleta tirk yên qada çandiniyê got: "Armancgirtina binesaziyê û qûtkirina ava Firatê yekser bandor li ser çandiyê kir ku lewazî xist tevahî mewsimê."

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/ji-ber-erisen-dewleta-tirk-candini-bi-xeteriye-re-ru-bi-ru-ye-41700

Çavkanî:JINHA



## Jinên ku hevberdanê kirine di bin zexta civakî de ne

Jinên ku li Îdlibê ji hevjinên xwe qûtbûne û hevjînê xwe winda kirine, bi gelek pirsgirêkên wek tacîz, tundî û zextên derûnî re rû bi rû dimînin. Jin dixwazin di jiyana xwe de biryarên xwe bi xwe bidin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-ku-hevberdane-kirine-di-bin-zexta-civaki-de-ne-41741

Çavkanî:JINHA



## Li Reqayê îstîhdama jinan zêde dibe

Jinên ku piştî ji DAIŞ'ê rizgarkirina bajarê Reqayê di qada aboriyê de hebûna xwe misoger kirin, bi projeyan îstîhdama jinan di jiyana kar de zêde dikin, dixwazin piştgirî ji projeyên aborî yên li Fabrîqeya Şûşekirina Ava Vexwarinê ya El-Firat bê dayîn.

https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/li-reqaye-istihdama-jinan-zede-dibe-41749

Çavkanî:JINHA



## Li Reqayê rola aborî û siyasî ya jinan hat nîqaşkirin

Desteya Jin a Rêveberiya Xweser derbarê xurtkirina jinan di aliyên siyasî û aborî de panelek li darxistin û derbarê xurtkirina jinan di aliyê aborî, siyasî, civakî û çandî de nîqaş hatin kirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-reqaye-li-ser-rola-abori-u-siyasi-ya-jinan-hat-niqas-kirin-41771

Çavkanî:JINHA



## Li Idlibê bi zewaca ne fermî mafên jinan tên desteserkirin

Li Idlibê jin dibin mexdûrên zewacên ji derveyî fermî, tenê şahid û malbatên wan şahidiyê dikin. Jinên ku neçar dimînin zewaca xwe îsbat bikin, di şertên hevberdanê de nikarin xwedî li zarokên xwe derkevin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-idlibe-bi-zewaca-ne-fermi-mafen-jinan-ten-desteserkirin-41787

Çavkanî:JINHA



**Kongra Star**

**4.11.2023**